Paşkoya Taybet bi 2’ê Rêbendanê, 64’mîn Salvegera avabûna Komara Kurdistanê
Taybet bi Hejmar 128 ya Agirî

agirî

64 salan berî niha, li 2’ê Rêbendanê de, yekemîn hikûmeta modern a kurdî di bin navê Komara Kurdistanê de bi Serokatiya Pêşewa Qazî Mihemed pêk hat. Ava kirina wê Komarê di dîroka gelê kurd û Hızba Demokrat a Kurdistanê de bi şanaziyek mezin û nuqte guhertinek bingehîn tê hesibandin.

Paşkoya Taybet Bi Boneya 2’ê Rêbendanê, 64’hemîn Salvegera Avabûna Komara Kurdistanê. Hejmar: 128

Peyama Deftera Siyasî ya PDK Îranê bi boneya 64’mîn Salvegera ava bûna Komara Kurdistanê

êvanên birêz!
Beşdarên hêja!

Hûn bixêrbên bo rê û resma 2’ê Rêbendanê, salvegera ava bûna Komara Kurdistanê.

Birêzan! Niha ku 64 sal bi ser ava bûna Komara Kurdistanê re derbas dibe û em pê dawêjne 65’mîn sala damezrana wê, li dirêjiya van salane de herdem ku derfet û fersenda bîranîna vê Komarê ji bo xortên gelê kurd pêkhatibe, bilind nirxandine. Ji ber vê ku ev Komare li jiyan û xebata neteweya me de bi tesîr û karîger bûye û ew bandore heya niha jî berdewam e.

Bandora wê Komarê ji ber wan taybetmendiyan ve ku niha jî bo gelê Kurdistanê girîng û bi pûte ne, lewre tê bibîranîn heta ku ceribînên wê bibin bi Çirayê riya tekoşînê bo gihîştin bi maf û azadiyên me ku pêkhatî ne ji.

Demokrat bûna Komarê.

Komara Kurdistanê li serdemekê de hat damezrandin ku rejîma seranserê Îranê Paşatî bû û desthilat ji bav ve wekî mîrat digihîşte kur, li wê zirûfê de danîna navê komarê li ser Hikûmeta Kurdistanê, nîşan û berjengek zelal û eşkere ji bawerîtî bi gel û guhertina desthilatê ji kesekê ve bo kesekê din. “Arçî Rozvêlt” ê Amerîkî ku wê demê bi seredan diçe Mehabadê, wiha dibêje: Mirov ji vê hemû azadiyê ku li Mehabadê de heye, ecêb girtî dimîne. Herwiha li cih de ye bi bîr bînim ku Komara Kurdistanê li rewş û kawdanekê de ava bû ku li parek ji Ewropaya demokratîk de ji ber ayîna ciyawaz ve, mirov li kûreyan de dihatin şevitandin. Lê wê demê li devera bin desthilata Komara Kurdistanê de, rêz ji peyrewên ayînan dihat girtin, qutabxaneyên taybetî ji wan re ava dikirin, tu kes ji ber bîr û baweriyên cuda ve nedihat zîndanî kirin û mafê raderbirrînê jê nedihat zewt kirin, rojname, kovar û pirtûk bi azadî dihatin weşandin û kesê mafê sansora tu nivîsekê nebû. Bi gştî azadiya tekoşîna siyasî berçav bû. Taybetmendiyek din a Komarê, giringîdan bi rêxistinên medenî û

Têmûr Mîstefayê Endamê Deftera siyasî ya PDKî

Sivîl weke jinan û lawan bû. Giringiya wî karî wê demê derdikewe ku em bizanibin kêmtir ji %1 a jinan li civaka wê demê ya bin desthilata Komarê de xwendewar bûn û Pêşewa Qazî Mihemed ji bo giringîdan bi vê rêxistinê, hevsera xwe dişîne refa Yekêtiya jinên Demokrat.

Taybetmendiya din a Komarê netewîbûna wê bû Bi vê wateyê ku li hemû beşên Kurdistanê de xelik li birêvebirin û xizmetkirin bi vê Komarê beşdar bûn. Li nava wan de bi taybet Barzaniyan bi Serokatiya nemir Mela Mistefa Barzanî rolek berbiçav hebûn û li rastî de Komara Kurdistanê bi destkewta xwe dizanîn. Ew xîm û bingehek baş ji bo bihêz kirina hesta bawerî bi xwe bûnê bû. Hestek ku bi salan bû ji ber kewneperestiya zal bi ser welat de rastî sivikatî û tepeseriyê di hat. Komara Kurdistanê tîrêjên xwe awêtne parçeyên din yên kurdistnê û hizra netewî û xebat li pêxema rizgariya netewî li hemû beşên Kurdistanê de bihêz kir. Ku bi xweşî ve niha piştî 64 sal avabûna Komara Kurdistanê li beşek ji Kurdistanê de ku xelkê wê bi parek ji mafên rewa yên xwe gihîştine, em rêz ji bîranîna Komarê digrin û hêvî dikin ku yad û bibîranînên Komarê li pêşerojê de li wî cihî de pîroz bikin ku Komar têde ava bû.

Komara Kurdistanê bi cîranên xwe re bi tilorans bû û mînaka berbiçav a vê tiloransê jî, peywendiyên dostane yên Komara Kurdistanê û Hikûmeta Millî ya Azerbaycanê bû, ku ji bo çareseriya pirsgirêkên navbera xwe de peymanek 6 xalî wajo kiribû. Li gor wê peymanê, arîşeyên navbera wan diviya ji riya siyasî û bi riya komîsyonekê ve ku ji bo vê meremê hatibû diyarî kirin, bihên çareser kirin. Herwiha peywendiyên navbera Hizba Demokrat, hizba pêkînerê Kamara Kurdistanê bi Partiyên Demokrat yên seranserî û netewî, hew û xebatek bû li pêxem demokratîzekirina Îranê û nimûneyek din ji hesta tebayî û hevkariyê.

Her ji ber wan taybetmendiyên ve ku li dijî bîr û baweriyên serberdayî yên rejîma Paşatî bû, rejîma Paşatî bi hevkariya Amerîka û Îngilistanê bi hemû hêzên xwe ve ketine pîlandanan û êrîşa bo ser Komarê, mixabin Komar Piştî 11 meh xebat û tekoşîna bêrawestan û encamdana zaf kiryarên girîng ku ji aliyê rejîmên din ve bi çend salan jî bi encam nedigihîşt, herifî û Pêşewayê gelê kurd, Qazî Mihemed jî piştî zîndanî û dadgehiyek neadîlane, di roja 10’ê Xakelêweya sala 1326’ê Rojî de hate darvekirin. Berxwedan û berevaniyên biwêrane yên Pêşewayê mezin li bêdadgeha nizamî a şa de bo dîrokê

maye ku cihê şanaziya Hizba Demokrat û neteweya Mafxwaz a kurd e.

Rejîma Paşatiyê Pêşewa li sêdareyê da û jêve bû ku bi darvekirina Qazî Mihemed, êdî fatiheya kurdan xwendiye, lê zaf nekêşa ku rêvîngên riya Pêşewa, tekoşîna li pêxem a armancên netewî yên xwe de domandin û ew alaya ku Pêşewa ji wan re bi cî hiştibû, bi çeqyayî hiştin.

Partiya me, Partiya Demokrat a Kurdistanê, partiya avakerê Komara Kurdistanê piştî 64' salan heya niha jî, bi armancên Komarê, demokrasî, mafên netewî, û dadperweriya civakî wefadar e û li pêxem a van armancan de bi hezaran xortên xwe gorî kirine. Li midehê 30 sal desthilatdariya Komara Îslamî de jî, gelê me ji ber mafxwaziyê ve ketiye ber pêla êrîşên tepeserkarane û cinayetkarane yên Komara Îslamî. Lê bi xweşî ve vê pêle nekariye gelê me bi çokde bîne û niha jî gelê kurd serbilind û rawestayî li qada berxwedaniyê de maye û Kurdistan yek ji deverên herî bi tesîr û bibandor yên Îranê ye ku li pêvajoya xebata mafxwazî û azadîxwazane de pêşeng e û bêguman li her guhertinek pêşerojê de, dê rolek girîng û çarenivîssaz bilîze.

Beşdarbûyên birêz!

Midehê 8 mehan e ku xelkê Îranê dest bi nerazîbûnek berfireh li dijî rejîma kewnarperwer û bi sitem a Komara Îslamî kirine. Ev nerazîbûn li rastî de, kerb û kîna pengorî ya xelkê li dijî desthilata hakim, piştî fend û fêlan li hilbijartina 10'mîn gera Serkomariya Îranê de teqiya û bi dirûşma "dengê me bidin", destpê kir û pêvajoyek bileztir ber bi radîkalîzetir bûn û dirûşmên "Mirin ji bo Xamineyî", Xamineyî qatil e wilayet a wî batil e" girte pêşber û niha jî bûye bi girîngtirîn bûyera Îran û cîhanê ku li medyayan de bi germî bas jê tê kirin û roj bi roj arasteyek nû bi xwe digre.

Partiya me berî hilbijartinê û destpê kirina vê bizava nerazîbûnê, helwesta durust û usûlî a xwe ku tehrîma hilbijartina gera 10'mîn a Serok Komariyê bû, ragihand û ew hilbijartin bi maşkanê Navbir. Bûyerên şûndatir û

fêl û tezwîrên berfierh li hilbijartinê de, maşkanê bûna hilbijartinê bi tewahî derxist. Ev tezwîr, fend û fêl guhnedana rêberên rejîmê derheq daxwazên xwepêşanderan binisbet dengên xwe, bûye hêcetek bo destpêka nerazîbûnê û bi milyon kes rijiyane ser şeqaman û dijberiya xwe bi wê hilbijartinê ragihandin

Partiya me li vê qonaxê de jî ragihand ku, ger pêvajoya xwenîşandanan ji xebata du belên hakim de ber bi tewahiya rejîmê bihê veguhastin û nerazîbûn pêvajoya Sekolarîzm û ber bi demokrasî bûnê bike armanca xwe, Partiya Demokrat her wek derbasbûyî dê li refa herî pêş a vê xebatê de be.

Bûyerên 13'ê Xezelwerê, roja Aşûra û tepeseriyên bêrehmane yên rejîmê li dijî xelkê bêzarbûyî ji zulm û stema Komara Îslamî, carek din bala cîhanê û civaka Îranê ber bi vê rastiyê kişand ku rejîma Komara Îslamî reform hilgir nine û bi maneweya Komara Îslamî li ser korsiya desthilatê, xelkê Îran û cîhanê xweşî û tenahiyê nabînin. Lewre bi yekalî kirina vê pirsê, hewcehî bi biryareke lêbrawane û dûr ji dudiliyê heye. Ji bo vê meremê jî, divêt xelik riya berfirehkirina tevgerê, ku ragihandina programek rohn û zelal e û xwastên para herî zor a xelkê li xwe de cih bide û bi vî awayî jî bikare hejmaerk zêdetir ji xelkê bîne meydanê û şêweyên cur bi cur yên xebatê, weke: xwenîşandan, mangirtin, daxistina dukan û bazaran û xebata menfî bigre ber xwe, da ku him meydana manordana xwe berfirehtir, him jî li meydanên cur bi cur de rejîmê bêxe tengasiyan de.

Derhep egera lihev kirina her du balên hakim û paşvekişyana bizava nerazîbûna xelkê û egerên piştî vê lihevkirinê, hewce dike bibêjim ku me her ji roja yekem ve, dilê xwe bi aliyên hevpar li desthilata totalîtarî a Komara Îslamî xweş nekiriye û egerek wilo jî bi baldan bi vê rastiyê ku her du balên hikûmetê maneweya Komara Îslamî armanca wan e, bi dûr ji eqli nezaniye. Hevdem, me jêve bû ku dijberiyê nav bask û eniyên rejîmê derheq hilbijartinê, tenê hêceetk bû bo serhildana xelkê bi nisbet xwast û daxwazên xirîserhev bûyî yên wan ku li derbasbûyî de xwe li xebata netewên Îranê, jinan, xwendekaran, kedkaran, mamostayan û bi dahan rêxistinên siyasî û civakî yên din de nîşan dane û armanca hemû ew rêxistinên siyasî û civakî, hiloşandina rejîma Wilayeta Feqîh û anîne ser kar a sîstemek demokratîk bûye ku têde mafên hemû takên civakê bihên berçavgirtin û parastin.

Em hêvîxwaz in ku ew bizave riya ber bi pêşdeçûn, geşe kirin û tevalî kirinê bigre pêşberî xwe û encamek dilxwaz lê şîn bibe, herweha tenahî û biarmanc gihîştina gelên Îranê li peyre bihê.

Beşdarên birêz!

Li vê rojê û li pêşberî we de, carek din em peymana wefadarî bi rêbaza Komarê ku xebat ji riya misogerkirina mafên netewî û demokratîk yên me ye, nû dikin û radigehînin ku dudilî û tewehoma derheq reform û guhertin an li çarçoveya Komara Îslamî û dan û standinên pêre, bi qazanca desthilatdariya tepeserkar û pir zulm û zora vê rejîma dijî mirovî tewaw dibe. Lewre take riya rizgar bûn ji çengên vê rejîmê, hewl, tekoşîn û xebat bo anîne ser kar a rejîmek Demokratîk, Federalî û Sekolar e ku hemû xelkê Îranê mafên xwe têde bibînin.

Silav ji yada 2'ê Rêbendanê !
Silav ji avakerên Komara Kurdistanê!
Herbijîn bi şadî.

2’ê Rêbendanê yek ji rûsortirîn xal di dîroka gelê kurd de.

Hevpeyvîn: Cefer Mubeşirniya

Di wê roja pîroz, li dara jiyana gelê me de kulîlkekê rûyê xwe pişkivand, li bajarê Mehabadê Serdarekî kurd nav û dengê xwe da cîhanê û ji her çar aliyên Kurdistanê ve mêrxasên gelê me riya Mehabadê şopandin û Komarek jê anîn dinê. Ew Komara heya ku diçe, cihê xwe di dilê me de qurix dike û hizra me ji bo rêvîtiya riya xwe kûrtir dike. Komara Kurdistanê bi rêberiya Pêşewa û hin Egîdên din dihat îdarekirin. Yek ji wan egîdan jî, Zêro Begê Herkî bû. Bo zaniyariyên zêdetir derheq zêro Beg û rola wî û bi giştî rola Bakûrê kurdistana Îranê li Komara Kurdistanê de, me wek duheftî nameya Agirî bi hewce zanî ku hevpeyvînekê bi Ehmed Begê Herkî (kurê Zêro Beg) pêk bînin. Mam Ehmed mirovekî bi temen, lê qise xweş û bi rûmet e. wî bi germî mêvandariya me kir û li ser daxwaza me, kurtiyak li jiyana xwe ji mere bas kir. piştre Cigareyek pêkir û ji mere qala Komarê û xebata Zêro Begê Herkî û rola eşîretên wê demê li Komarê de kir. Deqa hevpeyvînê li jêr de dikeve berçavên we.

Xalê Ehmed ji kerema xwe kurtiyek li jiyana xwe ji mere behs bike?

Ez Ehmed Behadirî, kurê Zêro Begê Herkî me, li sala 1935’a Zayînî li zozanek bi navê Bênar li devera Mirgewer a Urmiyê ji dayîk bûme. Wê demê mala me li Gundê Girdiwanê (li Mirgewer) bû, piştre em çûn gundê Kûkê li devera Qasimlû. Li wir min xwandina xwe despêkir, hevdem jî şerê 2’ê Cîhanî xwe kişandibû Îranê, Hesta netwî geş bibû, serhildan û paşan jî damezrandina Komarê derket holê. Malbata me jî tevlî Komarê bû. Min xwendna xwe heta 6 a destpêkî xand. piştî hiloşîna Komarê jî em ketinber êrîşan û neçar man ku ji Îranê derkevin. Çend mehan piştî hiloşîna Komarê em hatin Îraqê li gundê Kelekînê cihgîrbûn û niha jî li Hacyawa akincî me.

Di şerê Cîhanî yê 2’ê de hêzên biyanî li Bakûr û Başûr ve hatin nav xaka Îranê û li Kurdistana Îranê de jî fersendek çêbû ku gelê Kurd deskevtek netewî bidest bixe. Lê berî avabûna Komara Kurdistanê li Mehabadê xebat û hesta netewî û siyasî a Kurdan û bi taybet li Bakûrê Kurdistana Îranê de çawa bû?

Bi giştî hesta netewî pir xurt bû, piştî têkçûna hikûmeta Îranê û avakirina ser ji nû ya hikûmetek din bi Serokatiya Mihemed Riza Şah û bi alîkariya Îngilîs û Amerîka, qirar ew bû ku nawendên leşkirî yên wan dîsan vegerine hemû deverên Îranê. Yek ji wan deveran jî Kurdistan bû. Kurd bi wê biryarê tengav bûn. Lewma di mala Qazî Mihemed Xizrî li bajarê Şinoyê de hemû eşîretên Kurdan li Urmiye, Selmas û Şinoyê ve bigre heta Mehabadê, lihev civiyan û biryar girtin ku bi tu awayekê nehêlin ew Pasgehên Hikûmeta Navendî li Kurdistanê bihên avakirin û carek din zulmê li kurdan bikin. Qirar wisan bû ew eşîretên ku dikevine sînorê Azeriyan mîna hêla peywendiyê bibin ‘‘cebhe’’ û yên din piştgiriya wan bikin. Lewre ‘‘Cebhe’’ ji eşîretên Herkî û Şikakan di her çarmedorên Urmiyê de pêk hat, li her cihekê çeper çêkirin û karê xwe kirin. Hêzên Îranê jî hatin beramberî wan û çend salan şer berdewam bû, car car êrîş dikirin lê Kurdan ew êrîş dişkandin. Eger hêzên Îranê zaf bana, eşîretên din jî di hewara wan de dihatin û piştgiriya wan dikirin. Bîra min tê ku êrîşek kirin ser devera me li Urmiyê û şerekî mezin çêbû. Cara yekemîn jî bû ku Tang û Top anîn, îcar eşîretên Mameş, Zerza, Mengur, Pîran û ... hemû di hawara me de hatin bo cihê şer. Heta Kurdên Îraqê ên Rewend mîna Eşîretên Herkî, Xeylanî û Sûrçî jî bo şer û piştgiriyê hatin. Ew rewşe heta midehekê berdewam bû, heta ku Komeleya JêKaf hat avakirin û li Kurdistanê rêxistin kirin, xelkê bi germî pêşwazî lê kir û piraniya Kurdan çûne nav refên Komelê de. Piştî jî ew bû ku Hizba Demokrat a Kurdistanê di cihê Komela ‘JêKaf’ ê ava bû. Paşan Komara Kurdistanê hat ragihandin, dîsan hemû eşîret têde beşdar bûn. Pêşmerge û rêxistinek leşkirî birêxistin û li bernameya karê wan de bû ku beşên din ên Kurdistana Îranê di bin destê hikûmeta navendî de rizgar bikin.

Berî damezrandina Komarê Hizba Demokrat hat avakirin, di wan 5 mehan de heta ragihandina Komarê, beşdariya xelkê Bakûrê Kurdistana Îranê di xebata Hizba Demokrat de bi çi awayekê bû?

Bawer bike hemû aliyekê cihê xwe li wê xebatê de girtibû, heta dawîn eşîreta Celaliyan li devera Makoyê de jî têde bûn, ew ji hemûyan gerimtir û bihesttir bûn. Celalî, Erosî, Şikak, Şipîranî berî Komarê hemû di xebatê de bûn.

Di avakirina Komarê de rolê eşîran çi bû, yan jî Eşîrên sereke û Serokên wê hene ku xebat kiribin lê niha kêm bên bas kirin yan rola wan wunda be?

Ez vê bi însaf nizanim ku hin kes û eşîretên xebatkar di rêveberiya Komarê de niha navê wan wunda ye. Bo nimûne Şikak û Herkî, Celalî û Erûsî hem berî Komarê, hem jî di Komarê de heya têkçûna Komarê rol hebûn, lê yan nahên baskirin yan jî rolê wan gelek kêmreng dikin. Li rastî de basa Şikakan kêmtir tê kirin. Ji wan Emer Xan, Tahir Xanê Simaîl Axa, Simaîl Axayê Hiso, malbata Şêro û Sertîpê Mihemed Emîn û....

Di nava eşîretên wê deverê û bi taybet li nav Herkiyan de Zêrobeg yek ji wan kesan e ku zêde nav û dengê wî li Komarê de tê bihîstin, başe nexş û rolê wî çi bû?

Nexşê wî ew bû ku em di bin Serokatiya wî de ketin hêla peywendiyê. Zêro Beg yek ji 34 Serok Eşîretan bû ku xwastin bo Hikûmeta Bakûyê. Li wir bû ku Hikûmeta Rûsiyê soz da wan ku dê Hikûmeteke Kurdî ava bikin, piştî hatina wan bername danîn ku nehêlin hêzên Hikûmeta navendî bihên Kurdistanê, li wê derê Zêrobeg bi eşîra xwe ve bûye Bereya (Cebhê) Başûra Urmiyê, aliyê dinê jî Şikak û Reşîd Beg û Begzade bûn.

Ji aliyê Şikakan ve eger hêzên zêde hatiban ser wan, eşîretên Celalî, Erosî dihatin alîkariyê. Ji aliyê me jî (Başûra Urmiyê) di dema givaşên zêde ên Hikûmetê de eşîretên

Mehabadê, Şino û Pîranşarê di hewara me de dihatin. Li teşkîlata Hikûmetê de 4 Jeneralên eslî û paşan bavê min jî wekî jeneral hatin diyarî kirin (Bavê min, Mela Mistefa Barzanî, Reşîd Xanê Bane, Emer Xanê Şikak, Mihemed Husên Xanê Seyfî Qazî). Cebhe dan wan jeneralan, Cebheya Serdeştê dan bavê min, ya Bane dan Heme Reşîd Xan, ya Seqizê dan Emer Xanê Şikak û Mela Mistefa Barzanî. Her yek ji wan di cebheyê xwe de bi armanca rizgarkirina beşên din ên Kurdistanê dixebitîn. lê di dawiyê de Rosiyan îxanet kirin û Îranê sozek direw da wan û Rusiye li soza xwe ya ji bo Kurdan peşîman bû û pişta Kurdan berda.

Hevdem ligel desthilata Kurdî, dethilatek din bi navê Komara Azerbaycanê jî hebû, di wê demê de riftar û livîna wan du desthilatan bihevre çawan bû?

Destpêkê de baş nebû, lê paşî bihevre rêketin û lihevkirin ew bajarên ku akinciyên wê Kurd û Azerî bin, îdareya wan hevbeş be.

Li vê derheqê de, rojekê Konfiransekê li Urmiyê li dar dixin, min zaf bihîstiye û di zaf kitêban de jî dîtiye ku ew Konferans li Kunsolxaneya Rûsiyê çêdibe. Azerî dibêjin ku Urmiye hemû Azerî ne û tu Kurd têde ninin û wan mafê dexaletê tune ye. Di wê demê de bavê min Kursiyekê hildigre û li ber derî didanê û li ser dirûnê, paşan dibêje niha hûn dê çawa derkewin derve, rast e Azerî li bajar bi xwe de zorahî ne û kurd kêmanî, lê derdurên wê bi temamî Kurd in û tu riyên din tu ninin. Di wê demê de Azerî wê yekê dipejirînin û peymanê girê didin ku li Urmiye, Selmas û Xoyê de îdareya hevbeş hebin.

Ew hevpeymaniye bi xwasta xelkê bû yan deshilateke sepandî?

Ne desthelatekê sepandî bû û bi dilê xelkê nebû, lê neçar bûn û diviya ew peymane hatiba cî bi cî kirin, çunku dujminekî hevbeş hebûn.

Wî çaxî eşîrên Bakûr tu peywendiyek ligel Başûrê Kurdistanê de hebûn yan na?

Deftera Siyasî li Mehabadê zêdetir li wan meselan haydar bû. Ya rast li Başûr jî beşdarî Komarê bibûn, lê ne wek deverên din yên Kurdistana Îranê weke Sine, Kirmaşan, Îlam û Loristanê. Li hemû deverekê Pêşmerge hatibûn û beşdarî di Sopaya Komarê de kirin, herwiha Kurdên parçeyên din jî têde beşdar bûn.

Piştî hiloşîna Komarê, di devera we de xebata Siyasî a Kurd derbasî çi qonaxekê bû?

Xebatkar hatin tepeser kirin û bi giştî xebata siyasî sekinî. Yên ku mabûn, tenê Barzaniyan xwe teslîm nekir û bavê min jî berxwe da. Paşan hikûmetê hêz anîn ser me û şer çêbû, hetanê 25'ê Newrozê şer berdewam bû û paşan xwarin(erzaq) û teqemenî nema, em neçar man ku bo Kurdistana Îraqê paşde bikişin. Li deverên din jî serkut û tepeser kirinek tund hebû, heta ku Hizba Demokrat a Kurdistanê xwe vejand û rêxistina xwe sazman da û dest bi xebatê kir.

Piştî nemana Komarê li wir ruhiyeya xelkê çawan bû, gelo tu hêviyek hebûn ku hizbek yan rêxistinek din cihê Komarê bigre?

Tenê hêvî û omîda xelkê bi Hizba Demokrat bû. Ew bû ku hêviya me jî di dawiyê de vejiya û nehişt ku dara hêviya me biçirmise.

Gotinek heye ku piştî hiloşîna Komarê, eşîretan û yek ji wan jî Herkiyan pişta Pêşewa berdan, lewma Pêşewa neçar ma ku xwe teslîm bike. Raya we li vê derheqê de?

Ew gotinek nerast û bê bingeh e, bi qasê ku ez dizanim çi berî Komarê û çi jî midehek piştî hiloşîna Komarê li çi deverên din ên Kurdistanê bi qasî Herkî û Şikakan şehîd nedan û bi eşkere li himberî hikûmetê jî rawesta bûn. Roja ku Pêşewa xwe teslîm kir qirar bû jeneralên Komarê li Mehabadê bi Qazî re bicivin û rêçareyekê bibînin. Lê Qazî li ser peymana Şah, xwe teslîm kir û nesekinî heta ku jenralên Kurd bigihîjin Mehabadê û bi hevre bişivirin. Nexa qirar bû basa teslîm bûna Azeriyan bê kirin û li wê navberê de ew, divêt çi bikin. Ew bû ku jeneral gihîştine Mehabadê, lê Pêşewa nedîtin. Pêşewa li wir birin Bokanê û paşan jî birine bal Serleşker Humayon li Seqizê, êdî li wir hemû bihevre zîndanî kirin.

Di wê demê de Zêro Begê Herkî çikir?

Wê demê bavê min li Serdeştê bi 900 çekdaran çû Mehabadê û dema zanî ku Pêşewa xwe teslîm kiriye, vegeriya gundê me (Kûkê) li Urmiyê. Hêzên hikûmetê jî li Tewrêzê de hatin û ji gola Urmiyê ve derbasî Urmiyê bûn. Hêzek din jî çûbû Mehabadê. Bi her hal huşdarî dan bavê min ku xwe teslîm bike, lê bavê min teslîm nebû û hêzên Hikûmetê êrîş kirin ser me, lê şikest xwarin. Dubare şer berdewam bû û ew şer 4 meh û 22 rojan kişand û hem me û hem jî Hikûmetê, xesar û goriyên zaf dan û paşî em neçar man bihên Îraqê.

Piştî çûna Barzaniyan bo Sovyetê, çawa bû ku hûn ligel wan neçûn?

Li Geliyê Gader Barzanî 3 rojan li mala me de ma, bavê min lê pirsî ku çima tu wezivirî Îranê? Got: nameyek ji me ra hat ku têde daxwaz kiribû em xwe teslîm nekin û ger tiştek wiha rû bidaba, malbata me hemû û 5 Serkirdeyên din yên Barzaniyan jî dê bihatiban îdam kirin. Barzanî got: Şêx Ehmed ji me pirsî ku ji te û Mihemed Sidîq kê amade ye vegere? Ew amadegiya xwe nîşan dide û bi 500 kesan ve vedigere û daxwaz ji Turkiyê û Sûriyê kirin ku wan werbigrin, lê ew wernegirtin, lewma derbasî Rûsiyayê bûn. Lê tu tiştk tevî bavê min bas nekir, nexa bavê min dê pêre biçûba Rûsiya.

Mamê Ehmed gotina we ya dawî derheq Komarê yan xebata berdewam a Hizba damezirînerê yekem Komara Kurdî?

Komara Kurdistanê deskevtek pir girîng ya kurdan e. Hizba Demokrat jî her li ser rê û rêbaza Komarê xebata xwe dişopîne. Ez jî heya mabim rêya Komar û Hizba Demokrat ji bîr nakim û hertim di dilê min de ne. Min ew şîrete jî li zarokên xwe kiriye ku hîvîdarim bicih bînin. Sipas jibo we rêvîngên riya Komarê û xebata

Cejna 2'ê Rêbendanê Bi Awayekî Germ Hat Pêşwazîkirin

Cejna 2'ê Rêbendanê 64'emîn salvegera avabûna Komara Kurdistanê, li piraniya gund û bajarên Kurdistana Îranê bi awayekî germ û taybetî hat pîrozkirin.

Bi hilkevta cejna 2'ê Rêbendanê 64'emîn salroja avabûba Komara Kurdistanê, li piraniya gund û bajarên Kurdistanê, herwiha binkeyên PDKÎ li Başûrê Kurdistanê û çendin welatên Eurûpa, Amerîka, Kanada û Ustraliyayê şahî û govend û çalakiyên cur bi cur birêve çû.

Endam û alîgirên nihênî û cangorî ên PDKÎ li seranserê Kurdistana Rojhilat, bi çalakiyên cuda cuda cejna 2'ê Rêbendanê pîroz kirin.

Hêjayê gotinê ye hinek ji çalakiyên ku bi wê hilkevtê hatin lidarxistin ev in: Belavkirina wêneyên rêberên şehîd ên PDKÎ û nivîsîn û bilavkirina tirakt û diruşmên taybet bi wê roja dîrokî pîroz kirin.

Ew çalakî di rewşekê de birêve çûne ku hêzên ewlekarî û Besîc û kirêgirtiyên rejîma Komara Îslamî a Îranê seba 2'ê Rêbendanê, li Kurdistanê awarte ragihandibûn, lê bi wê rewşa ewlekarî û nizamî jî, endam û alîgirên nihênî û qehreman ên PDKÎ bi piştgirî û hevkariya gel cejna 64'emîn salvegera avabûna yekemîm Komara Kurdistanê bi awayekî berfireh pîroz kirin.

Di binkeya Palîtbîroya PDKÎ de li bajarê Koyê yê Başûrê Kurdistanê û bi beşdariya nûnerên partî û rêxistinên siyasî û çandî û civakî ên her çar parçeyên Kurdistanê û herwiha sedan kadir û pêşmerge û endamên wê partiyê cejnekî mezin û berfireh hat lidarxistin û Teymûr Mistefayî endamê Deftera Siyasî ya PDKÎ bi wê hilkevtê peyamek xwend.

Li Navenda 3'ê ya Kurdistanê jî cejna 2'ê Rêbendanê bi coşek taybetî hat pîrozkirin û Sidîq Derwêşî endamê Komîteya Navendî ya PDKÎ û berpirsê Navenda sê ya Kurdistanê peyama Navenda sê pêşkêş kir, Derwêşî di peyama xwe de tevî amaje bi rol û bandora Komara Kurdistanê di wî serdemê de, tekez li ser aliyên cur bi cur ên rewşa avabûna Komara Kurdistanê û herwiha kesayetiya bilind û karîzmatîka Pêşewa Qazî Mihemed, ew deskevte bi deskevtekî neteweyî û berhema berxwedan û canfîdaiya mêrxas û egîdên netewa Kurd di Kurdistana Îranê de hesiband.

Di çendîn welatên Eurûpayê, Amerîka Kanada û Ustiraliyayê şahî û çalakiyên cur bi cur bi cejna 2'ê Rêbendana îsal, 64'emîn salroja avakirina Komara Kurdistanê hatin lidarxistin.